

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Lîbnanê. 35 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 5 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 25 Qemerî.

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc: Weqîf Tabet, Telefona Dîwanê: 74 04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

Xebatkeran Zora Kaldaran birine

Gehnekên bijartîna civatmiletê britanî hatine seh kirin. Xebatkeran zora kaldaran birine. Serekwezîr Çorçîl karberdana xwe qedimandîye Kralê Britaniya Mezîna, û wî ew pejirandiye. Kral teklîfî M. Klemen Atlê, serekê xebatkeran kiriyê da ko ew wezareteke nû çêke. M. Atlê gotiyê erê, bûye serekwezîr û ketiyê şûna M. Çorçîl. Serfirazîya partiya xebatkeran, di vê bijartîna de zehf mezîna bû; û wezaretê wan bê arîkarî û tevkariya partiyên din, ango kaldar û azadmendî, dikarin karên nejad û welatê xwe û yê Kîşwerê Britanî bigerin.

Eve awayê demokrasî. Eve tevger û terbiya xelkên Ewropayê. Gava millet dibêje, divê tu herî û yekî din bê û bi karên milletî mijûl bibe, ev peya, ev serêk bi çiqasî mezîna ji be, bi çiqasî bi kêrî milletê xwe hati bê jî, bê ko de wê xwe veke, diçe; û bi rastî Çorçîl mirovekî zehf mezîna bû, hîdîk britanî bi qasî wî xidmeta Britaniya Mezîna û Kîşwerê di wê kirine. Lê Çorçîl dizane ko ew mezînatîr di van tiştan de, gotina milletê, û her wekî millet gotiyê, wîlo çêdibe.

Demokrasi

Dewlet, hikûmet, wezîr û wezaret, polis û cendîrme bi vî û destê milletê tene danî, û karê wan parastîna heq û qanûn, rahetî û xweşîya xelkê ye.

Civatmilet, ji nîmîndeyên milletê bihevketî ye; û weklîlên milletê serekê dewletê dibijêrin; hikûmet, ango wezaret, bi destê serekwezîrê tête dayîn; heke nîmîndeyên milletê qîma xwe pê tînin, ew wezaret dimîne, heke no, ew diçe, û yekê din tê cihê wî.

Emê wî tiştî bi awakî din dibêjin. Geradîna karên milletê destê milletê de ye. Lê her wekî du, se, û carna çel an pêncî milyon peya nîkarîna derekê de bêne civandîna û îşê xwe bimeşînin; millet jî xwe re weklîlan dibêjêre; ji wan re nîmîndeyê an naibê tête gotin.

Ew weklîlê millet in, û hikûmet û qudretê destê wan de ye.

Tiştê ko ew bi piraniya dangan dibêjin, qerar didin, dibe qanûn û li gora wê qanûnê, ango awa û îşîkê, karên milletê tene geradîna.

Civatmilet, yê ko ji nîmîndeyên milletê bihevketî ye; serekcîmhûrekê dibijêre, ev serekê dewletê ye.

Serekdewletê jî xwe re serekwezîrêkê dibijêre û bi destê wî, wezaretê tête dayîn. Ango se dangêhê dikeve pêgava.

Civatmilet, Serekcîmhûrê û Wezaretê.

Civatmilet, ji weklîlên milletê bihevketî ye; ango xwediyê qanûnê û qudretê ew e.

Serekcîmhûrê bi destê wê tête bijartîna, û serê dewletê ye. 4, 5 an 7 salan, di cihê xwe de dimîne û di wî, yekî din; an heke mirovekî qenc e, û milletê jê hez kiriyê, ew bizwe, di sa dîkare bête bijartîna.

Lê, ji karê dewletê, yê ko rast bi rast berpirsiyar e, ne ew e; serekwezîrê û tebatên wezaretê ne.

Her wekî me gotiyê, serekcîmhûrê serekwezîrêkê dibijêre û bi destê wî wezaretê tête dayîn.

Wezaret, di bin qontrola Civatmiletê de, karê dewletê û milletê digerin.

Nîmîndeyên milletê ji wezaretê bi tevgerî, û ji her tebatên di wê, dikarin her tiştî bipirsin; û wî divê berîna pîrsên kirî hema, an piştî çend rojan bidîgê.

Heke civatmiletê qîma xwe bi wezaretê ne anî, ew wezaretê dikeve, û yekê din, ko civatmiletê qîma xwe pê tîne, dikeve şûna wî.

Di Wezaretê de, li gora hewcedariyê wezîr hene.

Mîna wezîrê hindurkarîgê, yê dervekarîgê, yê kevnedariyê, yê maldariyê, yê şerî, yê zanîna û xwendegahan, yê karê civakî, yê paşrojmenîyê.

Benda diwemîna de, emê gata wezaretan, û kar û zebatên di wan bikin.

KEVNEZAN

Gotina Mezinan

Ji mezînaqên Xwedê e çêtir, mirov e; heke li gora heq û edaletê dimeşe; lê ew, ji hemî heyanan xirabîrê, gava bê îşîlê û qanûnê, bê heq û edaletê di de distîne. Bi dinyayê de, ji zalimê ko destê wî de qîwet heye, piştî û xwînaxwartirîstiyê nîne; û di welatan de ko qanûnê heq û edaletê nîne, insan jî qedrê xwe dikevin; û dibin kêmî heyanan.

Methelokên Kurdî

Serê sed nevalî nevalek e, serê sed pîrsê, pîrsêk e.

Yek qendelûkê bi destê xwe bigirî û pê bigerîhî û ji pey gotîna xwe na vegehrîhî.

Du jin diwanek, du file karwanek.

Mîrê Hekariya jî jinîkekê xwedî heft zaroyan pîrsî:

— yadê, zaroyên te çawan in?

— jînkê gotê: bila xwedê canê wan bistîne.

— Mîr ecêbmayî ma û lê vegehrand: heft kurên te hene, çîre wîlo dibêjî?

— jînkê got: bila yek biwa, bila mîna te biwa.

Çîn û Japon

Ev heşt sal in, leşkerên çînî ên gernas qerî japonan dikin; da ko wan zorkeran jî welatê xwe derfînin.

Di nav heşt salên şerî de, der qerê çînî 2.521.000 segman û serbendên japonî hatine kuştin; xesarên çînî 3.178.000 in.

Cengê Pesîfîkê

6.000 balafirên emerîkanî, di dora giravên japonan de, der balafirgehan hatine kom kirin û ev bombeavêjî roj pey rojêkê bajar û şaristanên japonan didin ber bomban.

Karxane, destgeh, pîr û rêhesin, rê û rêgeh, bender û kar û barên japonî, bê etlahî tene xira kirin; û ejensa japonî Domeyî dibêje ko qerê erdê japona e meder, destpê kiriyê û emerîkanî, bi van homberdîmanan, rîya êrîşê di pêşîya qîwetên xwe ên tang û peyadan de vedikin.

Ji aliyê din, zehf balafirhilgirî di dora erdê japonan de digerin û dema hewcedariyê de, ji van gemiyan 1000 neçîrvan û bombeavêjî bi hewa dikevin û ji nişka ve, dirêjî payetextê japona Tokyo û bajarên din dikin.

Li gora nûçeyên dawîn, heft milyon eskerên emerîkanî teklîf qerê japona bîbin.

Ev qer, der se qadan çêdibe; li erdê Çînî, li Birmaniyayê û li Pesîfîkê; ango di dor û hindurê giravan de.

Li gora hina ev qer hejde meh dom bike. Hin dibêjin ko ew dikare du û heta se salan bajo.

Vegera Gernasan

Heta dawîya meha borî 396.000 eskerên emerîkanî ji Ewropayê xwe hilanîne û berê xwe dane welêt.

Di nav sîh rojan de, serfermandariya emerîkanî, dikarî bû 280.000 eskerên emerîkanî bexê rê.

Gava mirov dide eqilê xwe, ji bona rêkirina hinde peyan çî kar û barîna heja divêtin, eqilê lê ecêbmayî dimîne.

Ev esker, ji Emerîkayê rabûn û ji bona serbestî û azahiya civanê hatine welatên xerîb û xurbetê û tede xwîna xwe rijandine.

Xwedê wan kortên heja jî qeza û belan biparêze.

Bi Xwedê rast e; milletên ko ji bona armançên mezin, nikarin fidakariyê giran bikin, tu cara nagehin mezinahiyê.

Bi xweziya dest nagihne baqa kezîyan; û dilê tîrsok singê gewir na bîne.

Destpê bike!

Agir bi xaniyek ketî bû; deh peya lê diferîcin; û her yek jî van jî e din re dinehîrt; lê heta ko mêzekirin û texmînen wan giha dawiyê; xanî bû xwellî.

Agir bi xaniyek ketî bû, deh peya lê diferîcin; ji dûr ve peyayek hat û hema dest bi tefandîna êgir kir, e mayî dan dî û arîkariya wî kirin; xanî jî şewatê xelas bû.

Çiqas heja ye; ev peyayê ko, bê ko binêre dora xwe, dest bi kar û qenciye dîke.

Ma Zehmet e ?

Yê ko hero saetekê dixebite; dikare mehekê de; hîfî xwendin û nivîsandîna zîmanê xwe e detal kurdî bibe û pê ew jî sefê nezanan derdikeve û dikeve rîya zanîne. Ma mehekê xebat û zehmet, jî pêncî an qêst salên nezaniyê ne çêtir e. Kurdî divê bizanî; Xwedê, jî kerema xwe her tiştî da te; bedeneke xurt, rûyekî spehî, dilekî qewî, welatekî çeleng û comerd....

Kêmanîya te bi tenî nezaniyê. Pêxemberê me dibêje, ji bona zanîne, herin heta welatê çînî.

Pîsmar, Alfabe tenîştî te de ye; de destpê bike; jî te hereket, jî Xwedê hereket.

Xebat qer e, destavetê dibe rovi.

Sovyetistan

û daxwazên di wê jî Tirkiyayê

Rojname û Kovarên inglîzî bi pîrsa daxwazên Sovyetistanê jî Tirkiyayê, zehf mijûl dibin.

Li gora nivîsarên di wan, heqê ûrîsa ye ko ew jî tengava çeneq-gelayê ewle bibin, ango ev tengav ne keve di bin qontrola kesê, ko dikare sibe berberîya ûrîsa bike.

Lê belê, bi wê pîrsê, ne bitenê Sovyetistanê û Tirkiyê; dewletên din jî bendewar in; û di civanê se mezinan de li Potsdamê, û bi tevkariya Fransê jî, jê re çareyek divê bête dîtin.

Ji aliyê din zehmet e, mirov qasî bibe, ko tîrk qertîne qebûl bikin, ko pê azahî û biserxwebûna wan dikeve kêmaniyê.

Tede şîk hindîk e ko siyaseta rûsî tete dehîfandîna da ko Sovyetistan bibe dewletek jî yê Behra Spî, û li ser xebata wê, zehf delêlet hene ko ew dike di welatên Rohelatê Navîn de, pêq ve bikeve.

QEMERZEMAN

5

Şer ji wan re got: çima we xwe xisti bû vî halî? Xort jê re got: ev qîza hana kêçka apê min bû, û ez pir jê hez dikim û mi dixwest ez wê ji xwe re bînim, û tu dinêrî, bê ez çawa me l..

Xelkê ji kêçka apê mi re digot: çawa t'ê lawê apê xwe bî, kî, tu ji wîna çêtir î, tu ne minasibê wîna ye, heç digihayê ev pîrs jê re digot; pir ez pê diqehîrtim, min sûnd xwar, mi go ezê xwe bikime mişk û wêna jî bikim beq, heyani ko hinik ne bêjin mişk ji beqê xweştir e, ez wêna na kim.

Heç dihat digot beq xweşik e, mi ew dibin beft tebeqeyên erdê de dadixistin, te em ji vî halî xelas kirin, li wê derê kêçkê jê re got:

Go ya şer, ezê te, heslê te bidime zanîn, tu heslê xwe nas nakî. Şer jê re got:

Tu heslê min nas dikî; ez lawê kê me?

Keçikê jê re got: Ez nas dikim bê tu lawê kê ye; bavê te û diya te hene, extiyar bûne; niha di bajarê we de ne, navê wana jê re got:

Keçkê bi ser ve zêde kir û gote şer: Hakimê vî bajarî Mîr Seld e û kuştina wî bi destê te ye. Keçik ev tiştên ko hati bûn serê wî ji pêşî heyani paşî jê re got: go tu ji brayê xwe ne xeyide, emrê Xwedê wilo pê heye.

Niha, ezê dermanekî bidim te, ji bona çavê wîna, û ezê te derxim ser rûyê dinyayê, t'ê herî, sê saeta bimeşî, bigehî çadîrê keçika, esker li dora wan heye, ji wan re bêje: Qemerzeman niha li kû ye?

Wê te bidine zanîn, t'ê herî, Oda ko tède ye, çavê wîna t'exî şwîna wan û jê re bêje: sibehê bavê te wê bê, te bikuje, heger hat ez pê re deyin dikim, an bela te bikuje.

Sê cara jê re bêje, heger ji te re got bikuje, t'ê bavê wîna bikujî; ji bona rojekê heke doz kir t'ê bêjî, te ji mi re gotiye, bavê min bikuje; û min kust; ji bona navbeyna te û wî xweş be.

Derman dan şer û derxistin ser rûyê dinyayê, şer meşiya sê saeta, di şevê de giha çadîra, kêfa jîna wîna pir hat; jîna brayê wî digirî û jê re got: ya şer, ma tu li brayê xwe na pîrsî; îşev jê re ma ye; sibehê wê wîna bikujin; here ko tu wîna xelas kî.

Oda ko tède ye, jê re gotin. Di wê şevê de, şer çû Oda brayê xwe, gava ket devê Odê, nerî ko brayê wîna dinale.

Ban kiriyê; ya brayê min Qemerzeman, ez hatim di hewara te de, tu hesab ji te re çênebin.

Şer qedimî ba wî, çavê wîna ji bêrika wî derxistin, xistin çûna wan, ew dermanê xwe li ser da nî, çavê wîna gederê saetekê vekir, çavê wîna sipî sax bûn.

Şer jê re got: ya brayê min î Qemerzeman, havê te sibehê wê

bê, te bikuje, tu emir didî min ko ez wîna bikujim; te jê xelas kim.

Qemerzeman jê re got: ez ji te re dibêjim erê, ko bavê min hat wî bikuje.

Bû sibe, şer li pişt derî ve-şartiyê, Qemerzeman xwe wek berî girêdayî hiştiye.

Carekî nerî, ko bavê wî û du celadci pê re hatin, ketin hinduro.

Bavê wî got: ya Qemerzeman ev çî ro ye, tê bîra xwe û rojekê wiha ne dibir, go: tu herî dostika bavê xwe, ji xwe re bîni; di heqê te de kuştina te mi aniye; ezê va te bikujim! Qemerzeman jê re got: ya bo, tu dibêjî ezê te bikujim, ma Xwedê jî gotiye; ya brayê min î şer, derkev, wêre min jê xelas ke.

Dibê li wê derê şer derket û şwîrê xwe li serê Emîr Seld xist.

Ew û brayê xwe derketin û ban kirin ji ehlê bajêr re, gotin: me bavê xwe kuştîye, ke sik bi xwe ne xweş me kin.

Hemiwan jê re got: te bavê xwe kuştîye, a me çî ye; tu û wîna weke hev in.

Qemerzeman ji şer re got: mi tişkî ne qenc bi te re kir, li qisûra mi me ne rê, tu li çûna bavê mi bibe hakim, qenciya te ezê vegeřnim.

Şer bû hakimê bajêr, li dewsa Emîr Seld.

Çend rojan di wê kêfê de man, rojekê dixwaze ko dê û bavê xwe bibîne.

Ji meclisê xwe re got: navê dê û bavê xwe elam da wan û pîrsî: kî ji we wan nas dike.

Yekî go: ez nas dikim, çirane me ne; belê ixtiyar bûne.

Şer ji du eskerên xwe re got: herin mala wan, ji wan re bêjin, werin hakim we dixwaze, heke nikarin bimeşin, wana t'ekin erebakê, heger nikarin li erebê siwar bin, wan li ser darbestê deynin û bînin vir; heger wilo ne hatin emê herin cem wan

Esker çûn mala dê û bavê şer, nerin ko zelamekî ixtiyar e, û jîna wî wek wîna ixtiyar e.

Ji wan re gotin: kerem bîkin, hakim we dixwaze.

Li wê derê kete fikra wan û ji xwe re gotin: hakim bi me hesiyaye ko me lawê xwe, ne daye wîna ko bikuje, me avêt nevala şera; nihû şandîye dâ me ko me bikuje ji dêla wî ve.

Esker kirin û ne kirin ewan xwe da erdê ko em nikarin herin cem hakim.

Esker vegeriya cem şer, jê re gotin: pir ixtiyar in, nikarin bèn cem te.

Şer ji wan re got: emê herin cem wan.

Şer û bi meclisa xwe ve çûn cem dê û bavê xwe.

Gava bavê wîna hakim û meclisa wîna di, zehf tirsîyan; go: hatine ko me bikujin.

Serpêhati

Rovî û Dik

Rovîk sê şeva û sê roja bê xwarin maye, gelekî birçî bûye, hat nêzîki gundekî, nerî ko mirîşk û dikê wan, di nav wan de sekiniye; gava ko çavê dik bi rovî ket ji mirîşka re got, birevin rovî wê we bixwe, rovî ji xwe re got, ez bi vî hawayî ni karim tiştêkî bikim, ezê fenik xwe li wî dikî bikim, ji xwe re terîş anî; li serê xwe gerand, xwe kir wek heçkî; û ban kir dik go: me tirse, mi tobe kiriyê. Ji efalên xwe ê berê, ez dikim herim hecê, heçî ji we bi mi re bèn, werin.

Dik jê re got: madam tu rovî, te tobe kiriyê, ji efalid xerab, ê mi te wer, ez mele me; ez dixwazim bi te re bêm hecê.

Rovî meşiya û dik pê re çû giha çolê, carekê nêrin ko kewek li ser tehtekê dixwîne.

Rovî ban kiriyê go: were emê herin hecê, tu feqa ye, tu her roj dixwîni, hec ji te kê mî maye; kerem bike, emê herin.

Kew bankir, ji dik re got: çawa tu li rovî amin dibî, û tu ê pê re he rî wê te bixwe, li çolekê.

Dik bankir jê re got: rovî tobedar e, şaşa xwe girêdaye, xwe kiriyê hecî, were emê herin, kew daket, bi wan re çû.

Giha ber avekê, Ordekek heyê, di nav avê de, ji xwe re dileyize. Gava çavê Ordekê bi rovî û hevalên di wî ket, bankir dik û got: mele, çawa hon, tu û feqa amin dibin, bi rovî re herin.

Dik bankiriyê, go: rovî tobe kiriyê û em dixwazin pê re herin hecê; heger tu jî bê, bi me re, kerem bike.

Ordek bi wan re meşiya. Rovî, kêfa wî pir hat, û pêşiya wan de dimeşe û çavê li kulekê digerîne. Carekê mêzand ko diyarekî bilind heyê, kulek tê de; ji hevalên di xwe re got; go: hon dizanin em gihane kî derê; hevalê wîna gotin: em ni zanin!

Rovî got: em gihane girê Erefatê emê îşev li ser girê Erefatê razin, ji bona ko em sibehê, zû, berî hecaca, herin tewafa hecê.

Hevalên wî, jê re gotin tu zanî. Rovî ew birin ber kulê û ji wan re got: hon herin hinduro, ezê li devê derî bim, ji bona ko kesek, tu derban li we ne xîne.

Hevalên di wîna, her sê ketin hinduro, rovî li devê derî de ma.

Kêfa wî pir hat û ji xwe re got: mi seyda xwe, bi rehîf anî, şaşa xwe li erdê xist û destê xwe avêt lingê dik; dik jê re got: weh hecî, tu ê çî bikî, ez mele me; ez bandana şerîf didim, çawan tu ê min bixwî?

Rovî jê re got: meleyê wê te, jinek wan heyê, ê te bîst jinên te hene, bandana te ji çîre ye, tu zinêkar î, jinên te bê mehr in, di heqê te de, ezê te bixwim; dik ji xwe re kir şiv û xwar.

Piştî nivê şevê, carekê di, birçî bû rovî, destê xwe avêt lingê kew.

Kew go: tu ê çî bikî hecî, ez feqa me, û ez quranê dixwînim, tu ji Xwedê na tîrsî, ko tu min bixwî.

Rovî jê re got: xelk serê sibehê, radibin ser xwe û dibên ya Xwedê, dirin kar û şixulê xwe, ê te, serê sibehê tu ê bê devê rîya wan, tu ê şer û zezabê bixwazî, xwendina te çî minfe-et dike? Rovî kew î xwar.

Sibehê rovî birçî bû car din, destê xwe avêt Ordekê? Ordekê jê re got hecî, min bide xatîrê keska ko li serê min e, keska pexember e. Rovî jê re got: ê ko keska pexember dide serê xwe, na hêle tu carî bilawite, ê te, tu ê herî keska pexember, di nav heriyê bidî û tu qîmeta wê nizanî, ji wî xatîrê keska pexember ko tu qîmeta wê nizanî ezê te dixwim; ew jî xwar.

ME BIHIŞTEW

MALDARÎ-PAŞROJMENDÎ

— Ji bona dan û standina navnijadin banqeke navnijadin de bête vekirin, Emerîka bi 2.750.000.000 dolaran û mîletên Cihanê ên mayî bi 6.050.000.000 dolarên zêr, wê bibin lebatanê vî avadanê.

— Bombardimana axa japonan a mader dom dike; cengkeşiyên emerîkanî li serê her deqîqakê 50.000 gule davêjin hêjagehan û wan dipelixînin.

— Di balafirihilgîrên emerîkanî û britanî de, yên ko dora giravên japonan de kom bûne, 1.400 bombe û torpilavê hene; ango deha hewcedariyê de, ji van gemîyan, 1.400 balafirên şerî, di karin bi hewa kevîna û dirîşî saristan û hêjagehên japona bîkin.

— Refên emerîkanî heta niha, tevî şerê talyan û elemanî, 2 milyon ton bombe berdane hêjagehen neyaran.

Kesarên Emerîkaniya

Heta niha kuştî, brîndar, windabûyî û hêsr tevde; 1.049.104 serbend û segmanên emerîkanî ji qîwet ketine.

243.165, heb hatine kuştin, 635.839 peya hatine brîndar kirin, 48.777 winda bûne. û 121.323 ketine destê dijmin û dûne hêsrî.

Xesarên qîwetên bejê 915.718; û yên behrê 133.386 in.

şer çû destê bavê xwe û diya, xwe maçî kir ji wan re got: ez lawê we me, mi hakim kuştîye, û ez li dewsa wîna bûme hakim.

Bavê wî û diya wî jê re gotin: tu lawê me tu ne nell Tu henekê xwe bi me dikî!

şer ji wan re got: ez lawê we me, we ez avêtîm nevala şera, şera ez bi xwedî kirim, ez gihame wî wextî.

Li wê derê bavê wî û diya wî yeqîn kirin ko lawê wan e; pir dilê wan xweş bû, kêfa wan hat, şer vegeriya mala xwe, jîna şer jê re got: tu çû bû kî derê!

Jê re got: bi Xwedê ez çû bûm cem dê û bavê xwe.

Jîna wî jê re got: dê û bavê te hene, heyî niha te ji mi re ne got: sibehê ezê herim cem wana, bibînim.

Sibehê jîna şer, keça Mîrê cîna rehmanî, çû nik dê û bavê şer, li halê wan nerî ko pîr in, sicada xwe danî, li ser rûnişt, şîva xwe lêxist go: ez dixwazim tu mi li nav beşçeyê bavê mi deynî.

Secada wê bi hewa ket û di nav beşçeyê bavê wê danî, darek sêva heyê, sêvek jê anî, û vegeriya cem dê û bavê şer; ev sêv şkenand ji her yekê re telaşîk sêvê da wan û gote bixwî.

Evana sêvê xwe xwarin, bavê şer bû xortekî çarde sall, diya wîna bû çîzek çarde sall.

Xwedê teala emreki nû da wan.

Ketin kêfxweşiyeke delal.

Heçî vî qîsetê bixwînin. Xwedê emreki nû bide wan jî,

ye ko gotiye

SILÊMANÊ HESEN MERCÊ

Strana Kurdi

Ceçcê Sildê Nado

Heyla wayê!... Axao, ne m'go bela gerek ê çêneba, li çemê Karê, li Maselê, li Maselâyê; ne m'go, bela kesekî pesna xwe ne daba, ji xeynî Sildê Nado, firarê dewletê, siwarê serxweşê xalê Şewqî, bavê Dillîşae, dibê roja qal û qewamê giran, kaba xwe dida erdê fişekê xas, vala dikir ser ebaê...

De heyla waê, qer giran el axao, ne m'go bela gerek ê çêneba li çemê Karê, li Maselê, li ber pirê; ne m'go tivinga destê Sildê Nado, gaz û girê; erê, wele ne m'go wê rojê, çehde şihûdê Sildê Nado, firarê dewletê; gelek hene, tivinga destê Sildê Nado, diçirise mala findê mûmê, ferî çirê termê birê, de heyla qer giran el

Axao, ne m'go, bela gerek ê çêneba, li çemê Karê, li Maselê, li diyara, ne m'go teqîn ketiye, van çaplîyan, van nextaran, ne m'go, li meydanê nallî ketiye, birîndaran, erê, wele ne m'go ezê ne ketime ber xema kuştinê, lê ez ketime, ber wê xemê.... dibê çawa kuştine Sildê Nado, firarê dewletê, siwarê serxweşê xala Şewqî, bavê Dillîşae, dibê, çawa fro, ji sibe di, sînor fire bûne, li dijîman û li neyaran, de heyla wayê, qer giran e.

Axao, ne m'go, bela gerek ê çêneba, li çemê Karê, li Maselê, wa bi der e, ne m'go, bela kesekî pesnê xwe ne daba, ji xeynî Ellikê Cemo, Ezlê Bavişkî, dibê çawa fro nigê xwe xistine rikêba gêncê, berê xwe dabûne, qesta çere, erê wele, wê rojê, dibê çehde şihûdê van xweşmêra gelek hene. dibê nigê xwe davêtin ser termê axaê xwe de, weçê xwe ji van neyar û berhûran qet veneguhêre, de heyla wa ê, qer giran el

Helan, û sê çaran bi min helan, qer xweş kirine eba belekan, kolos belan, qerê van xweşmêran, xweştir e ji zikrê şex û melan.

Amûde- Strancivîn

Qulingo

Lo, lo... Qulingo te mala xwedî xerabo, ji gulê û ji gulçînê, ji darê, ji darçînê ji gulavê, ji rehanê, ji miskê, ji indekwê, ji memikê qîzan û bûkan, ez ni zanim kîjan pir bi bîne, lo, weylo!

Çap û Nivîsar

KITÊBÊN NÛ

Di vê dawiyê de, ser Kurd û Kurdistanê sê kitêbên nû hatine belav kirin û her sê ji bi zimanê erebî ne. Nivîsevanên di van dostê heq û rastiyê ne; bi awakî xweş û bê meylidarî kitêbên pîrsa nijadê me xistine pê çavên xwendevanan.

Ev in nav û nîşanên van: Kurd di Sûriye û Libnanê de. Bi çema nivîsevanê heja û diktorê felsefê û zanînan civakî Dr. Edîb Mihewed.

58 rûpelên vê kitêbê hene. bihayê wê 100 qirîşên libnanî ye, heç ko vê kitêbê dixwazin peyda bikin: nav nîşanê nivîsevan ev e: Milk Debis; Tarîq Abdîl basit-El-Faxûrî. Bêrût- Libnan.

Kurdistan an Welatê Kur-

Keva min î gozel, vê sibehê xeyidiye, li ser hêlîne qet na xwîne, lo, weylo, qîzê vî zemanî, ji êvarê û hetanî destê sibehê, li paqîla xortê xelkê rakettî ne, lo weylo...

Serê sibehê radibin, misnê xwe hiltînin, berê xwe didin ser kanfka avê, dibê yadê, yabo, em soff ne, lo weylo, mereqlî me, lo weylo, sewdallî me, lo weylo, ji semedî çavê reş î belek, ez qaşxun im, fermanlî me, lo weylo!

Lo, lo... Qulingo te mala xwedî xerabo, tu wî, ji qulinga qulingê deşta vê Mûşê, t'ê hêlî, na xwe çêke li kela Koroxîlî, na wele, li ber taê vê karûsê, lo weylo, wezê par vî çaxî qîz bûm, li mala bavê xwe de bûm, sajîsal, ezê melûl bûme li ber darê vê dergûşê; lo weylo, mereqlî me, lo weylo, sewdallî me, lo weylo, ji semedî çavê reş î belek, ez qaşxun im, fermanlî me, lo weylo!

Lo, lo... Qulingo, te mala xwedî xerabo, tu wî ji qulinga qulingê vê yemenê, t'ê ji heval û hogirê xwe qetiya, wa bitenê wî bitenê, t'ê hêlîna xwe çêke li kela Koroxîlî, na weleh, li ser sûra vê bedenê, t'ê şevkê, ji nivê şevan û pê ve, de bê dizîya tewafa xana nîşana gerdenê; lo weylo t'ê destê xwe t'ê ke, nîşana qola na vê kimberê, bela bi ser de û lêvê te de bihata xwêdana anîya çenê, lo weylo; meraqlî me, lo weylo, sewdallî me, lo weylo, ji semedî çavê reş î belek ez qaşxun im, fermanlî me, lo weylo....


Lo, lo... Qulingo te mala xwedî xerabo, qulingê me t'ên û diqûngînin, per û baskê xwe dibêjînin, li pozê keleşa Mêrdîna şewitî, li cihkî birincî datînin, serê baskê wan quran in, binê baskê wan vasin in, lo weylo, de gavê ji zozanê jorî dadikevin, ji xwe re hûrik, hûrik lê dixwînin, meraqlî me, lo weylo, sewdallî me, ji semedî çavê reş î belek ez qaşxun im, fermanlî me, lo weylo

Lo, lo... Qulingo t'ê mala xwedî xerabo, tu ji qulinga qulingê Albeyaz î, t'ê hêlîna xwe çêke li kela Koroxîlî, na wele, li Qereyazî, te goştê canê mi helandî, lo weylo; te hestikê canê mi derizandî, lo weylo, sewdallî me, lo weylo, ji semedî çavê reş î, belek ez qaşxun im, fermanlî me, lo weylo!

Amûde- Strancivîn

PÊJINÊN DINYAYÊ

Xebat - Fidakari - Serfirazi - Serdesdi



JI BERGEHÊN LIBNANÊ ÊN BEDEW

Em banî welatîyên xwe dikin, werin xatirxwaziya Libnanê. Erdê Libnanê gelek çetang û spehî ye, xelkên di wê mêvanhevin û xerîdost in, çiyayên di wê, bi zehfî textîl gul û gulçîçekon xemilandiye, mêvanzaxeyên di wê hewadar, paqij, û dilniwaz in.

Kurdên tirkîye, iran, irak sovyetîstan û sûryegê werin dîlîna me, werin dîlîna behr û bender, çewî û deşt, mêrg û kanî, gir û çiyayên Libnanê.

Bihayê Serfiraziyê

Di wî serê mezîna de. ji 3-ye îlanê sala 1939-an û heta 31ê gulanê sala 1945-an, xesarên Britanya Mezîna û kişwerê di wê ev in: 1.427.624 segman û serbend ji qiwet ketine têde 532.033 kuştî hene. Di serê mezîna î herî de, der sala 1918-1918-an 3.490.907 peya ji qiwet ketî bûn û t'ê de 1.089. 919 kuştî hebûn.

Di vî serî de, xesarên hindî ev in: 23.295 kuştî, 12.264 wînda bûyî, 62.064 brîndar û 79.692 hêşir; hemî bihevêre 177.312.

Ev in xesarên mayîna: Britanya Mezîna 750.338, Kenada 101.008. Ewîstralya 92.211, Nû-Zeland 39.783, Efrika Nîroyî 36.765, Kolonî 36.376.

RADYO

Wefnekên heroje bi kurdî
Li Bêrûtê:

Radyoya Bêrûtê; li ser pêlên kurt û navîn, hero piştî nîro li saet pênc û sih deqîqan de, nûçeyên cihanê ên dawîn, bi zimanê kurdî belav dike. Dirêjahiya pêlan; pêlên kurt 37 mêtir û 39 sentimêtir; an 8.036 kilo sikil; pêlên navîn 411 mêtir; an 730 kilosikil.

Li BEXDAYÊ:

Hero piştî nîro di saet çaran de destpê û heta pêncan dom dike. Dirêjahiya pêlan: 42 mêtir û 37 sentimêtir; pêlên kurt.

Radyo Kurdistanê:

Li ser pêlên kurt diweşîne; dirêjahiya di wê; 42 û heta 44 û niv mêtiran. Hero, herî nîro li saet 11 û 45 deqîqan de dest pê dike.

RADIO AZIRBICANÊ :

Hero piştî nîro saet pêncan, li ser pêlên dirêj bi kurdî diweşîne. Pêlên dirêj; 1410 û heta 1415 mêtiran.

KOVAR

Rojname û çapên Kurdî

LI IRAQÊ :

Jiyan — Her hefte carekê derdikeve, çar rûpel e. Bendên wî hêja ne; bi tîpên erebî têtê çap kirin. Gerîndekariya wî: Sileymaniye—Iraq. Gelawêj— Kovareke kurdî a mezîn û hêja ye. Heftî û du rûpelên di wê hene.

Nivîsevanên Iraq û Iranê ên mezîn, nivîsarên xwe ên girane têtê belav dikin. Her serê mehê carekê derdikeve. Gerîndekariya di wê:

Şarî El Reşîd; Imaret Damiç, apartiman 5, Bexda-Iraq.

Dengî Kîtiyî Taze-Kovareke bi resm û wêne ye; sed rûpelên di wê hene.

Bi himeta balyozxana brîtanî têtê derê xistin.

Seydayê delal Huznî Mukriyanî û zehf nivîsevanên kurd, têtê bendên xwe belav dikin.

Ev kovar her dem çêtir û bikêrhatîr dibe.

Hejmarên dawîn de, wêneyên Kurdistanê, dihatin belav kirin. Bi tîpên erebî têtê çap kirin.

LI SOVYETISTANÊ :

Riya Taze - Di Ertwanê de dertê. Zimanê Kurdî Sovyetistanê ye; her hefte sê çaran derdikeve.


Têtê fikrên nû û nûjen têne belav kirin.

Çar rûpelên di wê hene: bi tîpên kurdî têtê çap kirin.

Gerîndekariya wê: Riya Taze; Ertwan; Sovyetistan.

Kovara Qefqasê - Kovareke girane ye. 32 rûpelên di wê hene. Nivîsevanên kurd ên mezîn ji yên hêla Qefqasê têtê dinivîstin; tîpên di wê kurdî ne. Her hefte carekê derdikeve.

Gerîndekariya wê: Kovara Qefqasê; Tiflîs; Sovyetistan.



Avahî û qesr û burcên Inglîstanê gelek guzide û spehî ne. Wêneya jorîn a Windsorê ye. Ji derve ne zehf xemilandi ye, lê bi kubarî û ziraviya xwe dilrîba ye. Kralê Brîtanya Mezin, xwedî tac û text Corc VI zehf çaran têtê Windsorê û têtê rojên xwe ên tenahî û etlahiyê diborîne.

Du keçên di wî hene; dota wî a mezîn bertextê Inglîstanê ye; piştî bavê xwe heke Xwedê xwest, ewê rûne ser textê Brîtanya Mezin.



Brîtanya Mezin bi park û bexçeyên xwe, bi parîz û çemenzaran bi nav û denge. Giyayên wê erdê di rengê keskekî tarî de ye û çav jê gelek hez dike. Bexçeyek ji yên dora Londrê. Rûniştimanên payetextê brîtanî nênazê piştî nîro, di van bexçeyan de rûdinin, mûsiqî di bi hisin, û çaga xwe vedaxwin û di wê navê de, zaroyên wan li ser çemenan dileyizin, bihna xwe vedikin.

LI ÎRANÊ

Niştîman: dengê kurdên Îranê ye; çel rûpelên di wê hene; kovareke qîmetdar e, bendên di wê têr rewneg in; li Leflicanê derdikeve.

Her çend jî bi herfên erebî derdikeve; hin bi hin bi tîpên kurdî jî emel dike. Gerîndekariya di wê: Niştîman; Lehican; Îran.

Kûhistan — Li Tehranê bi

zimanê farisî derdikeve; lê zehf bi karên Kurdistanê Îranê mijûl dibe. Qesda derketina wê çiyê xweş nayê seh kirin.

LI SÛRIYÊ

Hawar — Kovara bi tîpên kurdî a diwemîn e; şanzde rûpelên di wê hene.

Her panzdeh rojan carekê derdikeve. Gerîndekariya wê: Çapxana Tereqî;

Şam Sûriyê.

Ronaht — Kovareke kurdî a bi resm û wêne ye. Dilber û çeleng e. Her du heftan carekê têtê belav kirin; bist û dido rûpelên di wê hene; bi tîpên kurdî têtê çap kirin.

Gerîndekariya di wê: Çapxana Tereqî; Şam, Sûriyê.

Li Libnanê :

Stêr — Çar rûpelên wî hene; bi tîpên kurdî ye; her serê mehê carekê derdikeve; gerîndekariya wê: Weqîf Tabet; Bêrût.